Silav li koçka spî

Elî Bendî Ali-bandii@yahoo. Com

Eger mirov li dîrokê binêre, wê bibîne herdem dijminên kurd û Kurdistanê siyaseta kurdqiranê li Kurdistanê weku bername peyrew kiriye. Ev erd û axa bi pît û bereket dagîrkeran li ser xwe dabeşikirî ye, bi çavekê dujmnkarî berê xudaye xelkê wê bi taybet devera barzan, cihê serihildana şoreşên kurdî, çinku ev dever e her li destpêka sedê bîstê ta niho rolekê serekî di belavkirina hişyariya neteweyî de hebûye, her il ser demê şêx ebidilselam Barzanî berevanî ji maf û xwastên gelê kurd kirî ye û li çaxê Usmanîyan şîyaye devera Barzan ji zulim û stema dijmnan bîne derê û ji dagîrikeran biparêze û dijî wan bikeve şeran, lê cihê daxê bû li sala (1914) usmanîyan bêyî dadgeh li parêzgeha mûsil şêx Ebidlselam Barzanî li sêdarê da, ev hemî berpirsatîya mezin û giran bu kurê xwyê mezin şêx Ehmed Barzanî bicih hêlan û ev qaremane jî dijî dagîr kerên birîtanî kefite şera taybet li şerê cîhanyê êkê ku çend caran dagîrikerên birîtanî hewldaye devera Barzan dagîrbken bu jêrdeshelata xu, şkestin bidest veyna ta hikumeta Îraqê bi fend û fêlên xwe û bi harîkarîya dagîrikerên birîtanî û piştefanîya firukên şeriker çend caran hêrişên esmanî birine ser devera Barzan, melbendê şoreş û şoregêran û çendîn gundên vê deverê topbarankirin heta dumahyê biharîkariya leşkerê turkiya li sala (1935) şîyan şêx Ehmed Barzanî bêxisîrî bigirin û teslîmî Îraqê biken û hikumeta Îraqê jî bu jêriya Îraqê dûr êxist, rêberatîya milletê kurd dikefîte destê Mistefa Barzanî ku berî hîngê nav û dengê wî belav bibûn, bibu cihê tirs dilnerihetiya dijminan taybet piştî sinorên çend welatan derbaz bûye Yeketîya soviyetî yaberî û heta li sala 1958 zivirî ye kur distanê, êdî hikumeta êêraqê gehişte wê baweriyê ku neşêt kêşa kurdî li bakurê Îraqê çareser biket û agirê şoreşê li vê deverê bivemirîne neçarbû penabire danûistandina di gel Mistefa Barzanî, çinku dizanîn Barzan pêşenga serihildanên milletê kurd e û ew kes yên perwerdekirîn, ewên jîyana xwe hemû bi xebat û berxwedanê da borandî.

Ji ber van egeran her desthelatdareka li Îraqê viyaye siyaseta kurd qiranê peyrewbket û taybet rijîma Bas piştî li sala 1968 bidirsta hî deshelat wergirtî kefite giyanê xelkê Kurdistanê bi agir û asnî û kuştina bikum û girtin û sêdaredanê û bû vekirina tula şikestên xwe, herdem kurd taybet Barzanî bidujmnên Îraqê qelem didan û digutin yên harîkarîya dijminên me dikin, li sala 1983 di çar çûvê şerê Îraq û îran li devera Hacî Umeran leşkerê Îraqê toşî şikestineka mezin bû, heta Sedam Husên xwe qesta berukên şerîkir û serikirdayetîya partî gunehbarkir ku pêşmergên partî û Barzanî bûne egerê şikestina wan, ew bû piştî ji berukên şerî vegerîyay demildest ferman da, her dû biramakên xwe (wigban û Barzan) ku kesekê ji Barzanîyan nehêlîte sax, ew bu li spêdehîya ruja 31/7/1983 bi piştevaniya hêzên muxbiratê û ziriposa bi ser ordigayên (behrike–Quştebe-diyana) dagirtin û her nêrekê jiyê wî ji (12 –80) salî girtin û bê serûşûn kirin weku tolvekirina şkestinên xwe, heta Sedam bi xwe di peyveka xwe da amaje daye ku her kesê harîkariya kurên Barzanî kiribît dê eve sizayê wan bît.

Ji vêre piştî borîna (22) salan li ser enfalkirina Barzanîyan dirê û resmekê ji hejîda roja 17/10/2005 cenazê pîrozê (503) enfalkiriyên Barzaniyan vegerandin bo hembêza Kurdistanê, bivegerandina hesitî û kiluxên sera li bîyayanên hişik bu axa

pîroza Barzan zozanên fereşînê bo cihê dilxuşiya kes û karên wan ku (22) sal bûn çaverê yê vegerandina wan, aşikirabûna gorên Barzaniyan bi cil û bergên kurdî û bi cemedaniya sor careka dî birînên me vekolan û dîmenên enfal û kîmyabaran û dirindetiyên rijîma gorbegor înane pêş çavên me.

Enfalkirina (8) hizar Barzaniyan ne tawana êkî bû dijî gelê kurd û Barzanîyan, belku hikumetên Îraqê êk li dîf êk çend caran deverabarzan bi agirê asnî hêriş birîne ser û gundên deverê di gel erdî rastqe kirîne û xelkê wê rewaney zîndana û biyabanên hişik û ordîgayên zoremilê kiribûn jêrdeshelata xwe.

Û bi dirindetirîn reftar di gel xêzanên wan yên bêsemyan kirîne, enfalkirina Barzaniyan li jêr berda bêdengiya welatên zilhêz, bo dirêjepêdan bi kiryarên dirindane derheq milletê kurd û encamdan enfal û kîmyabarana û peyrewkirina siyaseta cînusaydyê.

Evroke jî em hemû dibînîn rojane ka çewa tolên şehîdên me yê ji rijêmê ve dibin, ew dikitatorê duhî û pêrenfal û kîmyabaran encam day û çi hizir bo civakê nêvdewletî nekirîn bi rezîlî kefite di zîndana da û rojane yê dimirît, lê xwîna şehîd û enfalkiryên me bi fîro neçû, sereray ku rijêm hatiye roxandin û gorên bi komel berdewam dihête dîtin, kes û karên wan van dîmena bi çavên xwe dibînin, pitir birînên wan dişaryên, gelek jî tûşî nexweşyên derûnî bûne, 22 sale di nav derd û kolan da dinal in, zarok bê dîtina babê û dlovanî hatiye mezinkirin, hestîkên babê bo dizivirin ku 22 sal bûn çaverê zivirîna wî ji karwanê bêhîviyê.

Ev gorên bi komel şahid û giroven e bo dadgehkirina Sedam û Beisyên wî, dîsan girovê wê çendê ne ku îrada milletê kurd ji enfal û kîmyabarana bi hêztir e, roj bo roj rêzên gelê me pitir dibine êk û bi êk helwîst bersiva dijmnan diden, bila dijmin û neyarên me bizanin ku runahîya cenazê enfalkirîyan şawqê didete Kurdistanê û li ber şefiq û runahîya wan nemiran milletêkurd gehiştî ye asûyekê geş û ya vîyay yabdest ve dihêt, ev roke cil û bergên kurdî û peyva şirîna kurdî li kuçka spî runahîya day û cîhan hişyar kir.

Ew welatên li serdemê şerê sar çek û kîmya bo kurdqiranê daye dijmnê me, ev ro bi serşûriyê pêşiwazîya serokê Kurdistanê dikin û danê bi tawanên xwe diken û daxwaza lêburînê ji mlletê kurd diken, lê mixabin ew welatên ereb û îslamî yên harîkarî û piştevaniya rijîmê kirîn bo qelandina nivşê kurd û ev sîyaseta şofînî bi tiştekê şerî li qelem day her evroke jî sereray rûxana rijîmê ew welatên şufînî danê bi hebûna netewa kurd nakin, heryê me kurdan bi erebistanê ve girê didin û van kiryarên tîrorî û tund û tîjiyê li Îraqê rojane dihêne encamdan bêdengî û bêhelwîst in.

Dîtina van gorên enfalkiriyan li bîyabanên hişkên Îraqê bo van welatên ereban ewên herdem dibê helwîst taybet kumkara erebî şermezariyeka mezin e ew jî yê digehine wê baweriyê ku milletê kurd bi xebat û qurbanyên xwe gehiştiye vê qonaxê, dizanin ku doza kurd gehiştî ye astên bilind û deshelata Îraqê kefitî ye destê kurdan û senga xwe ya siyasî heye û xudan birîyar e, doza kurdxatira xwe ji çiyakên Kurdistanê xwastiye û silav kiriye koçka spî û pal vedaye, serokê Kurdistanê ji layê mezintirîn serokê welatê cîhanê pêşiwaziya serokî lê dihête kirin weku serokê millet, ev welatên zilhêz û biryarder gehiştîne wê baweriyê ku wan bi dirêjahiya dîroka dagîrikerda xedir li milletê kurd kiriye.

Ev roke jî her ew welat yê peymana di gel kurdan girê diden û çinku dizanin kurd xwdan xebat û dîroke kapaqije, xudan rêyazeka nemire, herdem dijî tîrorê rawesitîyaye, heta ev welatên herêmê jî hêdî hêdî jinwî yê xutê digehînin ku duza kurd gehiştî ye çi ast yê dibînin welatek binavê Kurdistan nêzîke dê cihê xu li ser nexşê cîhanê ket, jinwî yê navê kurdan dînin û dibêjin kêşeka li dev me hey binavê kêşakurdî û divêt çareserbkeyin.

Yê seredanên serukên kurd dibînin li seranserî cîhanê û çewa dihêne daxwazkirin jilayê serukên cîhanê ve û bi cil û bergên pêşmergatyê dihête pêşiwazîkirin û duza kurdî derbaz bu astên cîhanî û welatên mezin mîna emirîka û birîtanîya kurd kirîne hevpeymanên xwe û giringiyeka mezin daye ser.